Ji kelên Kurdistanê

Kela Nêrwe

Mihemed Abdula Amêdî

Yek ji şûnwarên dêrîn yên miletê kurd ku bermakê bab û bapîran mane, em şanaziyê pê dikin ew jî kela Nêrwe ye.

Bi dirêjiya dîrokê, vê kelê hejmareka nava bi xwe ve girtiye û ev nav hatiye ser û ev çende jî komek ji gelek danemrên deverê guh lê bûne û serhatiyên vê kelê û xweragiriya wê vedigêrin, nav even e:

1-Kela Nêrwe
2-Kela mîr Qeşeyî
3-Kela Cewanan
4-Kela Biraderan
5-Kela Pinyaniş

Ku hemû noke bi kela Nêrwe dihête niyasîn û ta radeyekî ev çar navên din hatine jibîrkirin.

Kela Nêrwe dikeve li kê derê?

Rojhelata jorî ya kela Amêdiyê dikeve li devera êla Nêrwe, nave gundê Nêrwe di berî de bû ku ji kevin de dikeve navbera du mîrgehê kurdî yên mezin, ew jî mîrgeha Hekarî û mîrgeha Behdînan, kela dêrîna kurdaye û gelek mîratî li senterê vê kelê hatiye kirin, ev kele li ser hisargehekê hatiye danan û para pitir ji wê deverê re cihên astê ne hemû çiya, şikêr, dol û nehal in û pişta kelê pehnavekî ya hey û aqarekê avê ye dibêjinê Hêştê. Ev kele li ser çiyayekî hatiye navkirin em dişên bibêjin wekî kelekê şekiriye, serê xwe helkêşiya ye navê esmanê de û bilindahiya wî (100) m. yê bilind e û ji layê pişt çiyayî yê bilinde heta ser çiya dikeve, rojhelat taxekê çiya ye û rojava wê di nav doleka berteng û dibe kevrê Sexsê, ango çiyayê Sexsê û jêriya wê cihê seyrangehên mîra bû û niha jî dibêjinê baxçên mîra.

Avahî û şêwê avakirina kela Nêrwe;

Xelkê deverê wesa vedigêrin ku ev kele serdemê mîr qeşeyî hatî avakirin li berî zayînê û demê sultan Husên Welî sala 940 mişaxtî

hevberî 1534z û sala 981k hevberî sala 1576z hukumranî li mîrgeha Behdînan dikir, birayê xwe xan Ehmed Beg kire hakimê kela Nêrwe ji ber ku kelek bû ji mîrgeha wî û demê mîr Mihemedê Rewandizî, Amêdiyê dagêrkirî li sala 1833 z Îsmaîl paşayê duyê yê Behdîna û çû çiya û giheşte kela Nêrwe xwe asê kir û ev kela nehate standin her wesa (Boldanî) ya navê kelê di pirtûkên xwe de
naniye ziman û dibêjin; "keleka asê bû ji kelên zozana".
Çend roj li sale hene hinde jûr lê hene û wesa dihatine gotin ku avahî vê kelên 368 jor tê de hebûn û ji kevin de avahî ji pênç jûr bûn bersîngê wan lêwanên mezin û dikevtine layê rojhelatî şûnwarên kelê:
Weku diyar kele hemû şûnwarekê mezine hatiye kavilkirin, belê di ser hindê re mirov dişê bibêje çendîn şûnwarên berçav lê hene ji ber kevnetiya vê kelê dizivre ji wana:
1-Du birkên avê
2-Sê newisk
3-Çar aqid
4-Pênç sêrîc û kêşana avê bi solîna (boriyên axê) hatibûne kelê û cihê sêriyê li bin kelê dihate çêkirin û av tê de umbar dikir û hînana solîna ya berze bû kesê nedizanî çawa hatiye, dergehek bi tinê diçe bilindahiya dergeh (15) m û gelek carên tengavî bi werîsa ji dergehî bi ser dikeftin û hindek cara bêstirk pê ve dikir û demê viyaba da hemû helkêşin silal. Ferehiya dergehê kelê 3m bûn û mirov bi 74 peysika ser dikeftina kelê.
5-Jêriya kelê baxçên mîra bûn heta nuke jî nêrgiz û sosin li çalîkeka nîva çiyayî hene dibêjinê çaliyaxana û bega û dibêjin: Bersîngê eywana Xatûniya çandibûn demê dihatine ser şaneşînê ev kele heta sala 1976 z ya avedan bû û çendî xêzan tê de akincîbûn, belê piştî çolkirina deverê ji layê rijîma Besa çepel, kela kavil bûye û jiyan tê de nemaye.

Jêder:
- *Heftnameya Peyman- jimare 346 çarşembe 14-11-2006 Mihemed Abdula Amêdî berperê (4)*
- *Duhok Behdînan 11 adar Parêzgeha Duhok Çapxana Duhok /bi zimanê erebî*
- *Govara desthelat xweyetî jimare yek salan heşt 1984 rûpel 29 /bi zimanê erebî*